Euroopan unionin osarahoittama

MANNERHEIMIN LASTENSUOJELULIITON Uudenmaan piiri

uudenmaanpiiri.mll.fi/rohkee

# ROHKEE!

Rohkee! Ew projeyek e, piştgiriya xwe ya darayî ji Sendîqeya Penaberî, Koçberî û tevlîkirinê Yekîtiya Ewropayê digire.( AMIF: engl. Asylum, Migration and Integration Fund). Tevlî Komeleya Parastina Zarokan (Mannerheimin Lastensuojeluliitto) ya herêma Osîmayê (uusimaa).

Grûpa ku ev proje wan armanc digire: Zarok û xortên ku temenên wan di navbera 9 – 18 salan de ne. Ew kesên ku ji Welatên Cîhana Sêyem (herêmên şer û qeyranan) gihaştine Helsinki û Vantaanayê (Helsinki, vantaa).

**Ev proje bi rêya zimanê dayikê bi gelek rêbazan piştgirtiyê dide zarok û xortan:**

- TRT- grûp (Teaching Recovery Techniques) ji bo zarok û xortên ku rastî qeyranan hatine.
Dema vê perwerdeyê 5 hefte ne (5 x 2 saet e). Ev yek di roja xwendinê de ji xwendekaran re pêk tê û ev yek li ser Wîmayê (Wilma) nîşana neamedebûnê çênake.

- Rohkee- grûp, piştgiriya tevlîbûna zarokan dike. Herwiha piştgiriya dîtina hevalan û geşkirina arezûyan dike. Ev dem 8 hefteyan dirêj dike. Ev yek li derveyî saetên dewama dibistanê pêk tê (8 x 2.5 saet).

- Piştgiriya derûnî ji zarok û xortan (takekesî- civakî) re dike. Ev yek di dema dewamê xwendinê de pêk tê û li ser Wîmayê (Wilma) nîşana neamedbûnê çênake.

- Rênimayên girêdayî xwendinê pêşkêş dike û piştgirtiya xwendekaran dike. Ev yek di dema dewamê xwendinê de pêk tê û li ser Wîmayê (Wilma) nîşana neamedbûnê çênake.

Euroopan unionin osarahoittama

MLL MANNERHEIMIN LASTENSUOJELULIITON Uudenmaan piiri

uudenmaanpiiri.mll.fi/rohkee

# ROHKEE!

**Zêdeyî vê yekê, di van hefeyan de sê grûpên arezûyan hene:**

-Koma Govenda Bobê ya Kûriyayî (Korean POP) ji kesên ku temenên wan di navbera 12 û 17 salan de ne. (Pasila, Helsinki).

-Koma Keçên Erebîaxiv ji bo kesên ku temenên wan di navbera 9 û12 salan de ne.(Kallati/ Vuosaari, Helsinki)

-Kafêya Zimanê Fînlandî ya xwendekarên dibistanên navîn. (Pasila, Helsinki).

**Hemû çalakiyên "Rohkee"yê ji bo kesên beşdar bêberamber e (bê pere ye).**

**TRT çi ye?**

"Teknîkên xwedinê bo dermankirinê". Ev teknîk di projeyê de tên bikaranîn. Ew di çarçoveya tendirustiya hişî ya zarok, sîpe û xizmên wan de, yên ku pêkan in rastî derbxwarinê werin, destwerdaneke komî û pêşîlêgir e.
Ev teknîkên dermankirinê, xwe dispêrin dermankirina reftarî-zanînî ya ku xwe dispêre derbxwarinê. Ew destwerdan piştgirtiya wan kesên ku rastî bobelatên xwezayî û şeran hatine, dike da ku derman bibin û zindî bimînin. Ev dermankirin bi rêya xwendina hûrgiliyên encamên derbxwarinê, rêbazên sivikirin û birêvebirina wê pêk tê.

**"Rohkee", piştgiriya herikbariya xwendinê dike.**

Ev yek bi rêya perwerdekirina kesên penaber pêk tê (ji Welatên Cîhana Sêyem). Herwiha piştgirtiya wê yekê dike ku xwendekar ji astekê ber bi asteke bilindtir ve biçin û xwendina xwe temam bikin. Herwiha bi çalakiyên komî radibe û piştgiriya tekekesan dike da ku di kar û xwendina xwe de bi ser bikevin û xwendina qonaxî hêsan bikin. Piştgiriya kesên ku di jîngehên biewle de rastî derbxwarinan hatine dike û ev yek bi pêşkêşkirina piştvaniyeke xurt pêk tê.
Bi vî awayî derfetê li ber zarok û xortan vedibe da ku tiştên nû fêr bibin û karînên xwe yên taybet nas bikin. Herwiha derfetê dide ku bi lêkolînên bêhtir rabin.

Euroopan unionin osarahoittama

MLL MANNERHEIMIN LASTENSUOJELULIITON Uudenmaan piiri

uudenmaanpiiri.mll.fi/rohkee

**Armancên projeyê (Rohkee):**

Armanc ew e ku tevahiya zarok û xortên di vê çalakiyê de beşdar bûne hest bikin ku wan ji bo çûna dibistanê piştgirtî wergirtine û bi serkeftina xwe bihesin.

Xalên hêz û karînê yên ku li gel wan hene nas bikin û bi xwendinên bilintir rabin û xwendina xwe berdewam bikin.

Rêjeya xwendekarên Welatên Cîhana Sêyem ên ku hatine Fînlandiyê û xwendin li wan şikestiye nas  bike û wan jî tevlî xwendinê bike.
Zarokên Welatên Cîhana Sêyem ji asteke xwendinê ber bi asteke din a xwendinê biçin û hejmareke herî zêde ji wan zarokan (zarokên malbatên penaber) derbasî zanîngehan bibe.
Herwiha zarok û xortên ku astengiyan di fêrbûn û xweşiyê de dibînin, destnîşan bike û piştgiriyeke çêtir li gor rewşa xwe bibînin.

**Ji bo tevlîbûnê peywendiyê dayîne:**


-Katri Kuikka (fînlandayî, îngilîzî û firensizî)
Birêveberê projeyê:
T: + 358 44 76 58 581
Email: katri.kuikka@mll.fi

-Reem Suliman (erebî, fînlendî û îngilîzî)
Kordîne
T: +358 44 4915709
Email: reem.suliman@mll.fi

-Olha Muravytska (okrayînayî, rûsyayî û îngilîziyî)
Kordîne
T: + 358 044 5005 395
Email: olha.muravytska@mll.fi


**Heke pêwîst bike tu dikarî "email"ê xwe bi zimanê dayikê, yan dengekî bi rêya "Watsap"ê rê bikî û di pey re em ê bi te re peywendiyê dayînin**